

Nûh li ser KORONA

KURMANJI
JMAR 7
NÎSAN 2020

Bi vê rengê hûn dikarin bi zarokan re li ser covid-19 bipeyivin

**Guh bidin zarokê xwe. Agahdaryên
rast peyda bikin. Xema xwe ji zarok re
ranegihînin.**

Rojname, televîzyon û înternet wêneyên mirovên nexweş nîşan didin. Her kes li ser vîrûsa korona diaxive. Lê famkirin dijwar e û zarok dikarin bi xem bibin. Gelek rêxistinê-zarokan li wir tîlefônê-pîştgiriye hene ku zarok dikarin lê bigerin. Mezinan hene ku bi zarokan re axivîn. Pir kes gazî Bris dikan (Mafên zarokan di civakê de) û zarokan pîparêzin. Pîsporên zarokên wan di heman demê de di derbarê mezinan de şîret dikan ka çawa bi zarokên xwe re biaxivin.

Zarokan natirsînin

Divê em xemê nedin zarokên xwe. Divê zarok zanibin ku dinya hem baş û hem jî xirab e lê yê mezin hene ku dixwazin dinyayê baştir bikin. Ji ber vê yekê, divê zarok dilsoz bin gava ew bipirse, lê ne bi tirsandin an jî agahdariya ku zarok dixwaze zanibe bêtir agahiyê bide.

Li zarok guhdarî bikin û pirsan bipirsin

Guh bidin pirsên zarokan. Yek caran ew napirsin, lê bi lîstikên ne baş dikan. Heger hûn dibînin ku zarok bi xem e, hûn dikarin bipirsin "Ma tiştek heye tu dixwazê bipirsê?"

Gava ku ew dibihîzin mirov nexweş dikevin û dibe ku bimirin, dibe ku ew bifikirin ku di malbatê de kesek bimirê. Hûn dikarin bi

zarokan re bipeyivin tevî ku ew dikare dijwar be. Fêma bikin ku zarok pir hestan e. Tiştek soz nedin, lê ji wan re peyda bikin ku ew li gorî temenê zarokan e. Û her dem hêviya zarokê bide. "Piraniya kesên ku nexweş dibin dîsa tendurist dibin".

Agahdaryên rast li ser vîrûsê peyda bikin

Ger zarok agahdaryên rast baş bibin, zarok hîs dibe ku ew kontrol dibin. Hûn dikarin diyar bikin ka vîrûs çawa tê vegirtin û ku ew ji bo zarokan ne wek ji mezinan re xeter e. Ji bo zarokên piçûktir hûn dikarin bibêjin ku vîrûs her roj nûçeyek mezin e ji ber ku ew bandorê li civakê dike. Ne hewce ye ku tiştên bi tirs bibêjin. Xwendekarên dibistanê rasterast pirs dikan. Dibe ku ew bizanin ka vîrûsek çî ye. Hingê hûn dikarin baş şirove bikin. Dûvre, dibe ku zarok bixwaze tiştek din zanibe. "Zarokan tiştan tirsnaq li parçeyên piçûk digirin," dibêje Rêxistina Parastina Zarokan.

Hêviyê bidin zarokan

Girîng e ku zarok zanibin mezinan berpirsiyariyê digirin. Li ser rastiyê bipeyivin ku lêkolîner kar dikan ji bo vaxlêdanê çêbikin, û her kesê ku nexweş dibin lênihêrîna nexweşxaneyê dibe. Cihên kar hatin girtin ji ber ku ew dixwazin vegertinê qut bikin. Alîkariya zarokan bikin ku bi tiştek din bifikirin an Korona, hêvî be ku bi tiştek normal. Nûçeyan bigrin û carinan jî tîlefonan rakin ji ber destan. Û li ser tiştên din bipeyivin.



Tevkariya krîzê wîlayeta Kalmar, tevkariyek di navbera hemû şaredarên wîlayetê ye, Navçeya wîlayeta Kalmar, Desteya Rêvebiriye wîlayeta Kalmar û hemî rayedarên din yê wîlayetê de hene.



VÄSTERVIKS
KOMMUN



facebook.com/krissamverkan.kalmar
facebook.com/vastervikskommun